Bidestveanîna Mafên Netewî
Yên Gelê Kurd Di Çarçoveya
Îranek Demokratîk û Federalî de

Hejmar: ١٤٧
٢١'ê Çiriya Paşîn a ٢٠١٠
Buha: ١٥٠ Tûmen


agiri

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye
Ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

**Sekreterê Giştî yê PDK Îranê di du peyamên cuda yên pîrozbahiyê de Cejna Qurbanê û cejna ayînî a Xawenkar ji pêrewên her du ayînan re pîroz kir**

R: ٢

# Rejîma Îranê li du biryarnameyên navnetewî yên cuda de hat mehkûmkirin



Di çend rojên derbasbûyî de her yek ji Rêxistina Netewên Yekbûyî (NY) û Saziya Cîhanî a Enternasyonal a Sosyalîst (ICU) li du biryarnameyên cuda de binpêkirina mafên mirovan, bi tayebtî kêmaniyên mesebî û netewî ji aliyê Komara Îslamî a Îranê ve bi tundî mehkûm û şermezar kirin.

Emê li du nûçeyên kurt de bala we xwendevanên hêja ji bo encama wan biryarnameyan rakişînin.

R: ٢

## Sarkozî li civîna NATO ya Lîsbonê: ''Rejîma Tehranê mezintirîn gefa mûşekî li ser Ewropayê ye''

R: ٧




Rûpel ٣



Got û bêjên bêencam
Dara Natiq

Rûpel ٤



Bi min re tu jî heyî
Ebdulla Hicab

Rûpel ٦



Wêrankirin di bi navê ...
Ceifer Mubeşirniya

Rûpel ٧



Komara Îslamî gefek...
Selîm Zencîrî


www.arsivakurd.org

## Peyama Pîrozbahiya Sekreterê PDK Îranê bi boneya dubare hilbijartina Mam Celal bo Serokkomariya Îraqê




Birêz cenabê Mam Celal,
Serokkomarê Îraqa federal
Tevî rêz û silavan!
Bi boneya hilbijartina dubare ya we bo Serokkomariya Îraqa federal, em pîrozbahiyek gerim ji we dikin û serketina we di wî erkê girîng de, hêviya me ye.
Bi vê hêviyê ku di vê gera Serokkomariya weyê birêz de, gelê Kurd li Kurdistana Îraqê bi hemû mafên siyasî ên xwe şa bibe.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Sekreterê Giştî**
**Mistefa Hicrî**
**١٢,١١,٢٠١٠**

## Peyama pîrozbahiya kek Mistefa Hicrî bo kek Mesûd Barzanî, Serokê Herêma Kurdistanê




Birêz Mesûd Barzanî,
Serokê Herêma Kurdistanê
Tevî silav û hurmet!
Em keyfxweş in ku destpêşxeriya we, lihevhatina gişt feraksiyonên Îraqî bo pêkanîna hikûmeta nû li pey re hat û dawî bi wê kirîzê anî ku heyamê nizîk bi ٨ mehan bû seqaya siyasî ya Îraqê dagirtibû.
Bi wê boneyê, em pîrozbahî û destxweşiyê ji we dikin û serketin û serbilindiya hertimî a we, daxwaza me ye.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Sekreterê Giştî**
**Mistefa Hicrî**
**١٢,١١,٢٠١٠**

## Peyama Pîrozbahiya Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Bi Hinceta Cejna Qurbanê

Bi hinceta cejna Qurbanê, ez Pîrozbahiyên xwe yên germ pêşkeşî gişt bisilmanên Kurd û xwîşk û birên xwe li Kurdistana Îranê dikim. Di vê rojê de em hêvî dikin ew qurbaniyên ku heta niha gelê Kurd bi xwîna ewladên xwe di pêxema azadiya netewî de daye, zû bi encam bigîje û gelê me li jêr zilm û zordariya zalimên zal bi ser kurdistanê de rizgar bibe.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Sekreterê Giştî**
**Mistefa Hicrî**
**١٥-١١-٢٠١٠**
**٢٤-٠٨-١٣٩٨**

## Peyama pîrozbahiya Sekreterê Giştî ê PDK Îranê Bi boneya cenja ayînî a Xawenkar

Bi boneya cejna ayînî a Xawenkar ve, ez pîrozbahiyên gerim ên xwe pêşkêşî hemû xûşk û birayên peyrewa ayîna Yarî dikim û hêvîxwazim ku li siya xebat û yekrefiya gelê me de, hemû xelkê Kurdistanê û bi taybetî Kurdên bawermend bi ayîna Yarî ku zêdetir ji hemû xûşk û birayên me yên Kurd li Îranê de li bin zulm û ferq û cudahiyên ayînî û netewî de ne, li destê rejîma dijîgelî a Komara Îslamî rizgar bibin û hertim li nav cejn û xweşiyan de bijîn.

**Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê**
**Sekreterê Giştî**
**Mistefa Hicrî**
**٢٠. ١١. ٢٠١٠**
**٢٩. ٨. ١٣٨٩**

# Beşdariya Şandeke PDK Îranê Li Şêvra "Înternational Socialist" Li Firansê




Roja ١٣-١٤'ê Çiriya Pêşîn a îsal, şandek ji Partiya Demokarata Kurdistana Îranê (PDKÎ) bi serperestiya Şaho Husênî, Endamê Komîteya Navendî ya PDKÎ, Luqman Ehmedî, Nûnerê Partiya Demokrat li International Socialist û Perwane Heyderî, Nûnera Yeketiya Jinên Demokrat ên Kurdistana Îranê li Rêxistina International Socialist, li civîna Şêvra vê Saziyê li Parîsê Beşdarî kir.
Roja yekem a civînê zirûfa aborî ya cîhanî û çawaniya peydakirina rêçareyan bo çareserkirina kirîza han li cîhanê kete ber niqaş û gotûbêjan. Herwiha pirsa xweza û hewildan bo parastina wê hat nîqaşkirin.
Çareserkirina pirsa tenahiya cîhanê û hewildan bo berfirehkirina demokrasiyê basa sereke ya duyemîn roja civînê bû û çend biryarnameyên pêwendîdar bi basên şêvrê di vê rojê de hatin pesendkirin.
Bi hewl û tekoşîn û li ser pêşniyara PDK Îranê, Rêxistina International Socialist, biryarnameyek li ser Îranê pejirand.
Li heyamê van du rojan şanda PDK Îranê ligel çendîn şandên din ên endamê Saziya International Socialist hevdîtin pêk anî û ev mijar xistin ber nîqaş û gotûbêjan:
- Bandora Îranê derheq têkdana ewlehiya Rojhilata Navîn
- Binpêkirina mafê mirovan, nemaze derbarê ntewên cuda cuda yên Îranê û pêwîstiya bihadan bi vê pirsê ji aliyê Rêxistina International Socialist.
- Bernameya Navokî ya Îranî û bandorên wê pirsê li ser helwest û siyasetên Rojava û cîhanê.
- Pêwîstiya piştevanîkirina opozisyona Demokrat a Îranê û hewlên opozisyonê bo pêkanîna guhertinan li Îranê.
Herwiha şanda PDK Îranê daxwaz ji endamn International Socialist kir ku xwedî helwest û siyaset;n ron bin li hember Rejîma Koamra Îslamî ya Îranê, nemaze derbarê mafên netewên vî welatî.

# NY'î pêpeskirina hovane a mafên mirovan li Îranê de mehkûm kir

Ew biryarname ku bi ٨٠ dengên ERÊ, ٤٤ Dengên NA û ٥٧ dengên bêalî hat pesendkirin, nîgeraniya xwe ji binpêkirina hovane ya mafên mirovan li Îranê de nîşan da. Li biryarnameyê de îşare bi tepeseriya xurt a çalakên mafên mirovan ji aliyê Komara Îslamî a Îranê, destbiseriyên bêsedem, dadgehiyên neadîlane, îşkence, riftarên hovane, birrîna endamên leş, kewirbaran, xendiqandin û...hwd hatiye kirin.

Herweha îşare bi ferq û cudahî û azardana kêmaniyên netewî û mesebî weke Kurd, Belûç û bisilmanên sunî dike.

Newekheviya cinsî jî li Îranê de rexne dike û serkuta parêzerên mafên jinan bi tundî mehkûm dike û îşare bi yasayên biferq li wî welatî de dike. Biryarnameya NY ji Komara Îslamî dixwaze ku soz û peymanên xwe li dor rêzgirtin û parastina mafê mirov de bicî bîne.Komara Îslamî heyetek bi serperestiya Larîcanî bona pêşgirtin ji pejrandina biryarnameyê şandibû Niyoyorkê, lê li hewlên xwe de biser neketin û biryarname hat pesendkirin.

www.arsivakurdi.org

# Got û bêjên bêencam



Dara Natiq

Birêvçûna pirosesa bernameyên navikî ên Îranê di çend salên derbasbûyî de bi merema bidestxistina çekên etomî , bûye cihê bas û nigeraniya civaka navneteweyî. Lê serbarê cehd û tekoşîna civaka navneteweyî û nemaze Şêvra Tenahî û koma ٥ +١ di pêxema sekinandin û biaştî kirina vê piroseyê de, lê mixabin rayedarên Komara Îslamî bê guhdan bi û xwastên cîhanî û zagonên navneteweyî, li ser merem û armancên biyom ên xwe heya gihîştin bi çekên etomî berdewam in.

Koma ٥ + ١, yek ji wan aliyan ku heya salek berî niha bi rêya gutubêjên tevî Îranê ve gelek liv û bizav kirin ku pirosesa han ber bi aqarek aştiyane ve bibin û karbidestên Îranê ji çêkirina çekên navikî ku bûye cihê nigeraniya civaka navneteweyî û dûrxistina wî welatî ji zanist û teknolojiya cîhanê, poşman bikin.


Her di encama wan got û bêjên de, di oktubera sala ٢٠٠٩an de, Îranê biryara hinartina uraniyoma dewlemendkirî bi ٣/٥ bo welatê Rûsiyê û Feransê bi merema guhertina wê bi şevata ١٩/٥ û piştre vegerandina wê bo reaktorên Etomî ên Tehranê pejirand. Lê piştî derbasbûna çend mehan bi ser wê biryara han de, rayedarên Komara Îslamî weke hemî carê bi hincetên nexuya ji biryar û sozên xwe paşegiz bûn.

Ew helwest û siyaseta han ji aliyê Komara Îslamî ve bû sedema pejrandina biryarnameya çaran a ١٩٢٩ ji aliyê Şêvra Tenahî û herwisan dorpêçên yek alî ji hêla Amerîka û welatên Ewropa û hin welatên Rojhilata Navîn bi dijî Îranê. Weke tê xuya kirin Amrîka, Rûsiye, Feranse, Birîtaniya û Çîn ji endamên hertimî ên Şêvra Tenahiyê tevî welatê Almanê, koma ٥ + ١ pêk tînin û di çend salên derbas bûyî de pêvajoya pirosesa etomî a Îranê dişopînin û daxwazkarê sekinandina wê piroseyê ne. Lê wan welatane heya niha bi nivîsandina çar biryarnameyên bi dijî Îranê di Şêvra Tenahî de, dorpêçên berfireh ên abûrî û leşkerî bi ser Îranê de pejirandine.

Di encama dorpêçên vê dawiyê bo ser Îranê û aloztirbûna rewş û zirûfa siyasî, ewlehî, civakî û abûrî û herwisan zext û givaşên hundir û cîhana derve bo ser wî welatî, rayedarên Komara Îslamî ragihandin ku ew ji bo destpêkirina gera duyem a got û bêjên tevî koma ٥ + ١ amaden e û ew çend jî zêde kirin ku wan welatê Turikiyê weke cihek hêja ji bo birêveçûna got û bêjan destnîşan dikin û pişkdariya karbidestên dewleta Turkiyê û Berazîlê di pêvajoya got û bêjên de bi bandor dizanin.

Lê ya ku di wir de dixuye merema Îranê ji beşdarî kirina dewleta Turk û Berazîlê di rûniştina han de, ew bû ku bi wê rêyê balansa hêz û deshilatê di koma ٥ + ١ de bi qazancê xwe biguherîne.

Lê di vî warî de Hêlarî Klînton, wezîra derwe ya dewleta Amerîkayê di dijkiryarek li hember wê pêşniyara Îranê de ragihand ku: ew bi berhevbûna welatên din di rûniştinên koma ٥ + ١ bi Îranê re razî ninin. Jiberku ew rûniştin taybet e bi bernameyên etomî ên Îranê tevî rayedarên wî welatî û delîveyeke baş e ji bo her cure gengeşe û mijarek hewce.



Li dîv wê helwesta dewleta Amrîkayê Katrîn Aşton berpirsa siyaseta derwe a Yeketiya Ewropa, di nivîsokek fermî de bo Seîd celîlî, dîplomatê payebilind yê bernameya navikî a Îranê ragehand ku: ev ji bo got û bêjên nû bi Îran re amade ne û bo vê çendê jî bervara ٥ê desemmberê di yek ji wan du welatan de anku Swîs û Otrîşê, bi cihek hêja ji bo birêveçûna wan rûniştinane dizanin. Navbirî di hemen demê de zêde kir ku wan bo rûniştinên dewra duhem li Îstenbolê tu girêpêçkek ninin, lê diviya got û bêjên destpêkî ên gera duyem tevî welatên ٥ zêde ١ li yek ji welatên Ewropî û bo heyamê ٣ rojan berêve biçin.

Lê ya ku di vir de bala mirov dikişîne, ewe ku karbidestên Komara Îslamî û nemaze Mehmûd Ehmedînijad, Serkomarê Îranê bi eşkere radigehînin ku merema wan ji encamdana wan got û bêjên tevî koma ٥ zêde ١ tenê ji bo baskirin li ser şêwaza modîriyeta cîhanî û çekên etomî ên Îsraîlê ye.

Li gor nêrîna zaf ji şareza û karnasên cîhanî, rayedarên Komara Îslamî dixwazin car din bi dirêjkirina dema got û bêjên û bi larêde birina bas û meremên sereke yên wan rûniştinane, demek zêdetir bi xwe re dest bixin, daku bikaribin bi wê siyaseta han roj li roj zêdetir bi meremên xwe yên biyom anku bidestxistina çekên etomî nizîk bibin.

Lewma bi baldan bi siyasetên çend salên derbasbûyî ên wî welatî û binpê kirina tev zagonên navneteweyî û pabend nebûna karbidestên wî welatî bi soz û biryarên xwe, dixuye ku got û bêjên vê carê jî weke tev rûniştinên berê dê bêencam bimîne û dom kirina pêvajoya wan got û bêjane tenê bi qazanc û berfirehbûna pirosesa Etomî a Îranê û nizîktirbûna wan bi çêkirina çekên etomî bi didawî tê.

Civaka navneteweyî dibe baş bizane ku Komara Îslamê a Îranê her di bingeh de tu baweriyek bi pêvajoya got û bêjên nine û ew dixwaze ku bi vê cure maşkaneyê û xapandina bîr û raya giştî û dirêj kirina demên got û bêjên, demek zêdetir bi dest xwe bixin ji bo gehîştin bi meremên biyome xwe.

Hewce ye ku civaka navneteweyî êdî li vê zêdetir bi wan siyasetên direvîne Komara Îslamî nehê xapandin û bi nîşandana helwestên jêhat û micid pêşiya wan pîlanên dijî mirovî ên Komara Îslam a Îranê ku bûye cihê nigeranî û têkdana tenahiya cîhanê û nemaze herêma Rojhelata Navîn, bigirin.

www.arsivakurd.org

RONÎ

Quncikek ji bo şiroveya bûyer û babetan ji xwendevanên "Agirî" re

**Ebdulla Hicab**



# Bi min re tu jî heyî

Ji feylesofê feranseyî Voltaire (François-Marie Arouet ١٦٩٤–١٧٧٨) gotin tê ku dibêje: "Ez qet ne bi dîtina te re me, lê ezê heya mirinê têkoşînê bikim ku mafê te yê wê gotinê bibêjî biparêzim". Eger li Çaxê Ronîbûnê li Ewrûpa têgeha Tehemûl pitir têgehek felsefî bû ku ji rewşenbîr û pêşengên civakê re mana hebû, îro pêwîstiya tehemul an zewtanîn li hember û famkirina dîtin, biryar, kiryar û ramanên cuda, rojane ji her kesî re û di her civakê de xwe nîşan dide. Lê gelo, her yek ji me, weke tak, heya ku ev têgeh bi ramana xwe re kiriye yek û em bi kiriyar wê yekê birêve dibin? Ji tak bi der, heya ku sîstemên ku em di nav de dijîn, êdî ew sîstem dewlet be, welat be, civak be an rêkxisitin ji bo bi sazî kirina wê têgehê alîkar e? Heya ku em ji raman, rabûn û rûniştin û dîtinên cuda re kêşa xwe weke dipîvan bi kar tînin? Tenê xwe weke çavkaniya rastî û heq û kes û aliyê din bi çavkaniya nerastî, ladan û şaşitiyan dihesibînin? Ji bo xwe hemû maf û azadiyan bi rewa dihesibînin û ji aliyê din re tû maf bi rewa nabînin! Lêgerên navtêder an harûjêner li ser riya me çî û çî ne?

Berewajiyê gotina têketinê û wan pirsên navtêder, ev kurtenivîs naxwaze bikeve nava basek felsefî an wan pîvanên exlaqî hilsengîne ku di derbarê têgeha TEHEMÛLê de bi giring dizane. Li vir Tehemûl, weke Maf, weke têgeh, weke pêwîstiyek ji bo ewlekariya civakê û jiyana arame bi hev re tê bas kirin. Tehemûl weke kevrê bingehîn di avahiyê civakek demokratî de ku ji mirovan re, tenê ji ber ku mirovin hûrmetê digre, mafê her kesî diparêze û ewlekariya jiyana her kesî misoger dike tê dîtin. Tehemûl li vir bingeha parastina mafê mirov e.

Bi kurdî gotinek bav û kalan heye ku dibêje:"Hindî tû ji xwe re datînî, hema her nebe nîv hind jî ji hevalê xwe re danê". Gotin di wan deman de tê bikar anîn dema yek bixwaze zêdegaviyê bike an tiştekê bi tenê ji xwe re bixwaze û gûh nede derûdora xwe. Ew gotin ji berê ve bûye pîvanek xwedî bandor di civakê de ji bo ku sinûrek ji kiryar an biryarek zêdegav re bê danîn. Mînakên dîrokiye Tehemûl li civaka Kurdistanê nîştan didin ku hêviyên xûrtbûna bingeha têgeha tehemûlê di pêşerojê de bi cî û pêwîstin, eger bê û derfet bê dan ku civak ji rastî, dîrok û pîvanên civakiye xwe xwedî derkeve.

Renge ev gotin li gor pîvanên îroyîne mafê mirovan û yasayên nûpejirandiye cîhanî nûqûstanî û kêmasî hebin. Lê dema mirov temaşey çarçoveya dîrokî û karîgeriya wê li ser bi cîh kirina têgeha tehemûl di civakê de dike, derdikeve ku civaka Kurdistanê pîvanek bingehîn ji bo parastina têgeha "TEHEMUL" û parve kirina erk û mafan daniye. Ew pîvan heya dema bindest kirina Kurdistanê û serdest bûna îdeolojiyên deravêj, zêdexwaz û dûçakîdaner jiyanek ewle ji bo hemû pêkhateyên civakê misoger dikir. Bi awayekê ku Kurdistan weke beşeke zor ji herêmên din yên Rojhelata Navîn bûbû mûzaîka gelan, kultûran û olan. Di her navçeyekê de Kurd, Ermenî, Asûrî-Keldanî-Siryanî, Bisliman, Êzidî, Yarisan, Cihû, Mesîhî, li ser sînûran jî Ereb, piştî sedsala ١٦ Tûrk, Tûrkemen, Azerî û Fars hemû bi hev re û her yek bi mafê xwe dijiyan. Di civakê de jî hemû reng û şeklên jiyanê bi hev re dimeşiyan û tehemûla hevûdin dikirin, bêy ku yek ji yê/ya din re astengiyan çê bike. Lê bi perçebûna Kurdistan û serdestbûna siyaseta dewletên deravêj û zêdexwaz re, gûlvedan û pêşketina civaka Kurdistanê ne li gor pîvanên kultûrî û civakiye gelê Kurd bi xwe, lê li gor daxwaza siyasetvanên bîhanî şekil girt. Ji wê demê ve pîvana tehemûl bi kiryar hatiye gûherîn û ciyê xwe daye pejirandina deselat û pîvanên deselatdaran û bindestkeran. Bi awayekê ku îro Kurdistan êdî ne ew herême ku di wir de pîvanên tehemûlê bi ser jiyana rojaneye xelkê de serdestin.

Gavavêtina ber bi paş ve di warê tehemûla cudabîr, cudahez û cudaxwazan de, renge bi tenê bi rewşa bindestiya neteweyî re girêdayî nebe. Gûherînên şêweya jiyanê û xwenîşandana reng û şêwazên cuda yên jiyanê, gûherînên ku li encama gûhertin di bingeha pîşesaziyê de hatin pêş û serhildana pîvanên nû yên civakî, kultûrî û siyasî li ser wê yekê bê bandor nîne. Di heman demê de şiyarbûna tak û civakê û zêdebûna îmkana "daxwaz kirinê" karîgerî li ser wê rewşe heye. Ji bo ku ew "daxwaza zêdetir" nebe hegerê zêdegavî û binpê kirina sinûrê daxwaza yên din, mercê sereke parastina pîvanên mafê mirovan e ku yek ji desketên herî bi nirxe demê ne. Lê dema ku ev pîvan ji aliyê deselatdaran ve hatin binpê kirin û parsenga navbera daxwazî, maf, erk û îmkanan ji bo hemû endamên civakê weke hev nebû, wê demê TEHEMÛL hem weke têgeh û hem weke pîvan tû derfeta jiyanê namîne. Êdî dema tehemûl nema, qûrbaniyê yekê ew tak, kom û alî ye ku bi pîvanên serdestan an bi pîvanên piraniyê re ne yek e.

Tehemulkirin nayê manaya destberdan ji dîtin û ramanên xwe û pejirandina bê rexne ya her biryar û kiryarekê ku bi ser mirov de tê ferz kirin. Tehemul ne bi manaya rêz girtin ji kiryar, biryar û dîtinên ku em jê hez nakin ya napejirînin re ye jî. Tehemûl rêzgirtin ji MAFÊ hebûna dîtina û kirina cuda re ye. Bi wê manayê ku mirov dikare ji dan û stan an dîtina kesê/kesa hemberî xwe razî nebe, lê di heman demê de ji mirovê xwediyê wê dîtinê re hûrmetê bigre, tenê ji ber ku ew Mirov e û her mirovek jî xwediyê mafê bingehîn e. Carna hebûna wan mafan dikare ji kes an aliyekê re nexweş bê, lê ew nexweş hatin nikare riya tehemûlê bigre.

Parastina mafê derbirîna dîtinê nayê wê manayê jî ku em naveroka dîtinê jî diparêzin. Dema yek mafê alîgirên jiyana bi hev re ya hevzayendan diparêze, ew yek nayê wê manayê ku parêzerê wî mafî bi xwe girêdaiyê wê şêweya jiyanê ye an jê hez dike. Dema mafê alîgirên olên cuda ji bo ibadet û rêzgiritin ji kultûrên cuda tê parastin, ew yek bi wê manayê nîne ku parêzerê maf hema diçe ser ol an baweriyek din. Her wek çawan dema parêzerê parêzvan mûwekilê xwe diparêze, ew nayê wê manayê ku kiryar an dan û standina mûwekilê xwe jî diparêze.

Parastina mafê yê/ya din ji bo ku weke bi xwe dixwaze bijî, bêje, bike, rabe û rûne, hizir bike û biryar bide pîvana serekeye ku nîşan dide heya ku her yek ji me weke tak, ev têgeh bi têgehîştin û kiryarê xwe re kiriye yek. Wê demê em dikarin basî tehemûlê bikin dema ku me fam kir hemû ew maf, azadî û berjewendiya ku em ji bo xwe dixwazin, kes û aliyê din jî maf heye ku wan mafan bivên. Hevdem beşek ji wan erk û berpirsayetiyên ku em hêvî dikin kes û aliyên din li hember me bi cîh bînin, em jî bidin ser milê xwe. Yanî her yek ji takên civakê û civak weke kom bi hev re wî mafî bide xwe ku bi heman awayî ku xwe xwedî maf dizane, her bi heman awayî jî kes û aliyê din xwedî maf bizane, her çi qas ku ew yek ne bi dilê mirov be jî.

Ji erk û berpirsayetiya tak li hember mafê yê/ya din pitir, erka sîstemên deselatdare

www.arsivakurdi.org

ku pîvanên tehemulkirina raman, rabûn û rûniştin, biryar û kiryarên ne wek yên serdest bi sazî bike. Lewma parastin û bi destûrî kirina pîvanên bingehîne weke tehemul ku mercê bingehîne parastina Mafê Mirovan e, erka sereke ya sîstemên xwedî deselate, êdî ew sîstem çi civak be, çi dewlet be û çi xwedî deselatek din, ferq nake. Di heman demê de ew pêgav rê nade ku kêş an pîvana hilsengandin û danîna çarçove ji bo raman, rabûn û rûniştin û dîtinên cuda re tenê hez û xwestekên kesan yên taybet bin. Ji ber ku dema kes an aliyek bi tenê xwe weke çavkaniya rastî û heq bihesibîne û kes û aliyê din bi çavkaniya nerastî, ladan û şaşitiyan bide nîşan dan, wê demê şikandina sinûrê tehemûlê dikeve di çarçoveya sîstemê de.

Cudaiyek mezin di navbera Tehemûl û têgeha anarşîstî li ser azadiya bê sinûr, bê berpirsayteî û ezonavendîtiyê (egocenterism) de heye. Sinûrê Tehemûlê li ciyekê tê danîn dema ku maf û azadiyên yek kesê/kesî, sinûrê maf û azadiyê kesek din derbas dike û dikeve çarçoevya zêdegaviyê. Êdî hingê mafê yekê mafê yê an ya din binpê dike û dibe bi yasayan bê sinûrdar kirin. Durêyane di wê de ye ka gelo kîjan pîvan ji bo danîna wan sinûran bên bi karanîn. Di vir de ye ku mijara kontrata civakî û yasayên ku civaka cîhanî bi hevdengiyê pejirandinine tê rojevê.

Lêgerên navtêder an harûjêner li ser riya pejirandin, bi sazî kirin û parastina têgeha Tehemûlê, weke yek ji mafên bingehîne mirov, pir in. Lê mercê sereke ji bo ku ew têgeh weke pîvan li bal her yek ji me cîh bigre, xwe dûrgirtin ji ezotî (egoism) û ezonavenditiyê ye. Çûnku ez- ezotî pîvanek sûbjektîv an zeynî ji bo heqî û niheqiyê, ji bo rastî û şaşitî, ji bo rasterê û ladanê datîne. Ev jî dikare kultûrek çewt ya ezonavendîtiyê çê bike ku mafdariyê tenê bi nêzîkbûna ji wê navendê re girê dide. Her çi qas kes an aliyê din ji wê navendê bi dûr be, hin qas mafê wê/wî kêmtir dibe. Ew dîtin di civakê de dûçavkî û tûnûtîjî jê derdikeve, di siyasetê de dîktatorî jê dizê û di zêhniyetê de binajoyî an fanatîzm jê hildikeve. Her çawan be encam her yek e. Hin kes bi buhayê binpê kirina mafê yên din ji xwe re mafê pitir datînin û wê zêdegaviyê bi sazî dikin.

Ji bo ku Tehemûl, weke Maf, weke têgeh, weke pêwîstiyek ji bo ewlekariya civakê û jiyana aram ya bi hev re di civakê de cîh bigre, pêwîste em wê bipejirînin ku bi me re kesên din jî hene ku weke me û bi qasî me xwedî maf in. Anî ez bipejirînim ku bi Min re Tû yek jî heyî ku bi qasî min xwedî maf î. Di wê demê de ye ku em dikarin çareseriyek navînî ji bo cudaiyên heyî bibînin, cudahiya bikin bingeha dewlemendiyan ku rê didin raman û dîtinên cuda, bi hev re bê alozî bijîn.

Tehemûl, keivrê bingehîn di avahiyê civakek demokratîk de ye. Civaka weha hingê dikare ava bibe dema ku me ew pîvan pejirand ku: "Hindî em ji xwe re datînin, em hin jî ji hevalê xwe re li ber çav bigrin". Dema ew têgehîştin li cem me xûrt bû ku em hûrmeta mirovan ji ber ku "mirov" in digrin û reng, ol, zayend, kar, darayî, welat, regez û ciyê kes di civakê de (social position) tû cudaty nexiste navbera mirovan de, wê demê me pîvana Tehemûlê li cem xwe daye rûniştandin. Wê demê êdî mafê her kesî, em bi xwe jî di nav de, parastiye û ewlekariya jiyana her kesî di yek astê de misoger bû ye.

Bi kinayî, em dikarin cuda bifikirin, wê cuda fikirînê bînin ziman, niqaşê li ser bikin, li hember dîtinên hev rawestin, lê di heman demê de hûrmetê ji hev re bigirin, ji ber ku em her dû mirovin û weke MIROV xwediyê maf in. Rast ji ber hindê ku erka me ya exlaqiye ku em mafê kesên din jî weke mafê xwe biparêzin, em neçarin ku tehemûl bikin, di gel ku ev yek ne bi dilê me û li gor xwesteka me be an hin caran kerbê me jî veke.

# Dijwariyên Jiyana Îro



Bêhzad Simko

Dorpêçên navnetewî ku îro bi ser Îranê hatine sepandin, bûne sedema dijwariyên zêdetir a jiyana xelkê Îranê bi giştî û gelê Kurd bi taybetî.

Dewleta Îslamiya Îranê, piştî dorpêçan Navnetewî, polîtîkek zor xirab û dijî mirovî li Îranê bikar tîne;Komara Îslamî bi bikaranîna fend û fêlên dijî ewlehî, aborî û civaka Îranê rewçek pir aloz û zehmet ji bo xelkê Îranê pêk aniye.

Dema ku sînorên serhedan hatin daxistin û kasibkarên serhedan tûşî pirsgirêkên aborî û bêkarî bûn, qesda karên pîşesazî û çandinî kirin. Dewleta Îranê, çi karek ji bo wê hindê re nekiriye û derfetên karî di warên han de ji bo xelkê Kurd pêk neaniye, belkî berevajî bi bikarxistina siyasetên şaş bûye sebeb derfetên heyî jî kêm bibin û armanc jî ew e ku berxwedana gel li hember çekdarkirin û besîcbûnê, bi çeka aborî bi çok de bîne. Zêdekirina mûçê (miaşê) besîcan û bertengkirina kar û barên aborî, nîşana wê hindê ye ku gelê Kurd berxwe dide û stûxwar nebûye û dujmin jî berdewam hewlên xwe dide.

Rejîma Koamra Îslamî ê şik bi bikaranîna siyasetên han kariye jmareyk ji gelê me bixapîne û wan neçar bike çekên rejîmê hilgirin û dijî gel xebat bikin. Lê her kes ku çekên rejîmê hildigire bi vê wateyê nine ku berxwedana gel rd dike û Kurdbûna xwe haşa dike, belkî pir zêde ne kesên ku bi neçarî karê han hilbijartine. Lewra em dikarin bêjin di nava wan kesan de îsanên baş û xirab hene lê her kes ji wan dikare bo derdora xwe karên baş bike û ji rêya alîkarîkirin, agadarîdan û kêmreng kirina pîlanên dujmin, bo welatê xwe xizmetê bikin.

Rewşenbîr û xebatkarên Kurdistanî divê pêwendiyê de erkek mezin li stûyê wan e. Diviya ew berdewam bo ji navbirina pilannên dujmin xebat û çalakiyên xwe zêdetir bikin û ger kesek ji Kurdên ku hatine xapandin bixwaze karek baş bike; diviya bi şarezayî û afirankariyên xwe vê derfetê bi baştirîn form bikar bigrin. Kurdên ku hatine xapandin ger bixwazin di nav himbêza gel de cî bigirin, gerek di wan rojên dujwar de kes û kar û welatê xwe ji bîr nekin û bo wê hindê hewla xwe bidin û ger kesek kete dafa dujmin di zûtirîn dem de wî-wê agehdar bikin.

Kurdên ku li nav sîstema dujmin de cih girtine; dikarin derfetên karî pêk bînin da ku hejar û ciwanên kurdan bibin xwedî kar.

Ger ew kurd bikarin wê xizmetê bo gelê xwe bikin, gel jî wan bîr nake û di rojên hewce de wan dê li himbêza xwe de bigrin.

Lê rewşenbîr, xwendekar û welatparêz gerek polîtîkên dujmin yên ewlehî û civakî bo gel ron bikin ta ku dujmin tûşî şikesê bê. Kuştina kesên bê tawan, bexşîna kesaytiyê bi mirovên lawaz û xapandina xelkê, timakar kirina kesên bêkar û kesên ku li warê aborî ve destkurt in, polîtîka dujmin ên eşkere ne.

Lê hewceye gelê Kurd bizane her diviya em bo xwe û paşeroja xwe xebatê bikin û çavê me li benda hêzên derekî nebe ku bên û derfetek bo me bînin pêş û me rizgar bikin. Xebat û têkoşîn gerek her berdewam be û nabe tu sîstem, kes û astengek hêviya me ji xebatê kêm bike û xebata me bide sekinandin.

Welat ciwane û wê hindê re pêwîst e pitir xebatê bikin û her kurdek ger bawerî bi netewa xwe hebe gerek xizmetê bike bi taybetî di rojên dujwar de û îro derfetek bo kurdên xapandî hatiye pêş daku bikarin karek bo xwe û civak û welatê xwe bikin û bo hemû kesan îsbat bikin ku dikarin di her qonaxekê de kurd bimînin.

# Wêrankirin di bin navê avedaniyê de



Ji bo asimîlekirina netewa Kurd û ji holêrakirina çanda wî netewî li ser axa xwe, Komara Îslamî heya sînorê wêrankirinê ji her riyekê mifahê distîne. Weke hemû aliyek dizanin, bajarê

Ceifer Mubeşirniya

Urmiyê du neteweyên sereke ên Kurd û Azerî têde dijîn û her du netewe jî li ser wê axê, weke hemû xelkê din yê Îranê, di bindestê rejîmek xwînxwar de ne. Lê Komara Îslamî bi bindestkirin û temisandina wan her du netewan jî razî nine û bi pîlanên xwe ên qirêj ji bo fitnexistin di navbera wan du netewan de, ji çi hewlekê xwe naparêze.

Emê di vê mijarê de, bas ji sê deverên girîng ên bajarê Urmiyê bikin ku niha rejîm bi navê xizmet û avedaniyê, tovê fitnê di wan deveran de diçîne û gefa asimîlekirinê li ser wan deveran li holê de ye.

Deverên Mihala Deşt, Biradost û Berandêzê, sê dever in ku bi tewahî Kurd in û tu hevwelatiyekî ne Kurd li wir de najî. Di wan deverên han de pirojeyên çêkirina Bendav "Sed" an heye ku Avbenda li Mihala Deşt "Avbenda Noşanê", berî ٦-٧ salan e karê wê bidawî bûye û du Bendavên din jî niha di qonaxa cî bi cîkirinê de ne.

Bi ezmûna ku ji Avbenda "Noşan" ê li Mihala Deşt hatiye wergirtin, tu pirojeyên bi wî awayî ên bi navê avedanî di deverên din ên Kurdistanê de bi mebesta xizmetkirin bi xelkê Kurd birêve naçin, belkî tenê ji bo têkdana rewşa jiyana xelkê Kurd û fitnexistne navbera pêkhateya netewî ya bajarê Urmiyê û derdora wê de ye.

Di beriyê de em hin basê zirarên wan Avbendan bo xelkê wan herêman bikin.

Deverên han seba helkevta wan û Kurdbûna wan, herweha nebûna kêmtirîn xizmet ji aliyê hikûmetê ve, weke her deverek din a Kurdistanê, bijîva jiyana xwe di riya ajeldarî û cotkariyê ve dabîn dikin. Lê di heyamê destpêka karê wan pirojeyên zirarmend, derfeta wan du pîşeyan ji xelkê wan deveran re zaf berteng bûye û di hin ji gundên wan deveran re bi giştî ji holê rabûye. Çimku herêma ku di xerîteya wan Avbendan de hatine destnîşankirin dikevin bin avê, bi giştî hat û çûn, çandinî û ajeldarî têde tê qedexekirin.

Ewa jî di halekê de ye ku heyamê qonaxa cî bi cîkirinê her çiqas be, heya dema ku Bendav bidawî nebe û ava Bendavê wan deveran negire, li hember qedexekirin "toqîf" a wan cih û zeviyên çavkaniya bijîva xelkê, tu xercek nahê dayîn. Hêjayî gotinê ye ku ew herêm û zevîzarên wan deveran ku cihek yekcar zor e, her wek me bas kir hin gund bi giştî tên qedexekirn, ji bo pêşgirî ji çerandina ajelên xelkê, zaf cihên wan herêman tên mînrêjkirin û karê han jî gefeke li ser ewlehiya jin û zarokên wî xelkî. Ku wa ye, berî bidawîhatina wan Avbendan, bo heyamê çend salan, ew erdên xelkê bêkar û bê hasil û ber dimînin.

Ji aliyekê din ve di şirketên karî ên wan Avbendan de ji nizîkbûn û berdewamiya kar jî mifahên xirab tên sitandin û kêmtirîn nirxa heqdest bi kirêkarên wan şirketan tê dayîn. Diyare tenê ji bo karên giran û metirsîdar ên weke di hundirê tonêlan de û şikandina razeberan "kevirên mezin" bi TNT ji xelkê wan deveran mifah tê sitandin. Her seba wê xemsariyê di wan karên metirsîdar de, heya dema bidawîhatina Benava Noşanê li Mihala Deşt ê, du ciwanên Kurd ên wê herêmê hatin kuştin û çend ên din jî birîndar bûn.

Lê xesarên mezin ên malî û netewî di qonaxa bidawîhatina wan Avbendan de ye. Bo mînak dema ku Avbenda Noşanê bidawî hat, hikometê bi ser xelkê de sepand ku bi erzantirîn nirx cih û warên xwe bi cih bihêlin. Bi wê nasyariya ku xelkê Kurd ji wê rejîmê hebû ku rehmê bi zarokên wan ên sava jî nake, bi neçarî jiber ku mal û halên wan nekevin bin avê, mehkûm bi wê zulma mezin bûn û bi nirxek yekcar kêm cihê jiyana çendîn saleya xwe çol kirin ku bi wê hezîneya li beramber cih û warên wan ji aliyê hikometê ve hatî dayîn, çi yek ji wan malbatan nekarîn xaniyekê ji xwe re ava bike. Bi wî awayî mesken û hêlûna kevnar a wî xelkê bêderetan ket bin avê. Lê hin ji zewîzarên xelkê ku neketin bin herêma avê, îzna mifahsitandin ji ava Bendavê ji bo hasilkirin li ser wan zeviyan bi xelkê wê deverê nehat dayîn.




Lê di hember de nirxek baş danîn ser wan zevî û erdan û bi dana wamên zaf bi moçexor û xelkek ne kurd bi taybetî Azeriyên derveyî Kurdistanê hat dayîn ku zewî û erdên wî xelkê awarekirî ên Kurd bikirin û wan deverên ku sedan sal e ji bilî Kurdan tu kesek li wir nejiyaye, ji Kurdîbûna wan deveran - gumanê çêke - ku xêncî fitneyek şûm tu tiştek din têde nine.

Çimku ger gumanek jî di hin deverên Kurdistanê de hebe, pirsek hevbeş a netewa Kurd û Azeriyan e ku bo rejîmê ferqa wan tune ye, her du netewan bi hevwelatiyên pile du dizane. Lê dibe her du gelên bira ên Kurd û Azerî ji wê yekê têgihîştibin ku armanca Komara Îslamî ne xizmet bi yek ji wan netewan e, jiber ku hertim di deverê de li ser serê xelkê wan du netewan de hizûr hebe û wan deveran ji ewlehî û aramiyê biherimîne.

Di rastî de, Komara Îslamî hebûna xwe di dutîreyî û dujmindariya xelkê Îran û deverê de dibîne û rejîmeke ku berevajî her zîndewerek li ser rûyê erdê, bi bêdengî û aramiya xelkê xwe hişyar dibe û bê sedem hewlên alozkirina tenahiya xelkê dide. Ger wa neba û armanca rejîmê wêrankirina gund û cihê jiyana xelkê neba û ew pîlan ji xwe re bi derfet nezanîba û mebesta xizmetê heba, xa çêkirina Avbenda Noşanê ٦-٧ Kîlomêtran jêheltir hatiban çêkirin, him geliyek mezin û bikêr hebû, him çi gund li wir nebûn ku xirab bibin, him jî ava wê Bendavê digihîşte ٣ deverên Mirgewer, Tirgewer û Mihala deşt û ji xelkê wê deverê re zaf bi mifahtir bû.

Guman tune ye ku her du deverên din ên Berandêz û Biradosta wate Geliyê Asingira jî ku hêj karê wan bidawî nebûye, xincî wêrankirina çendîn gundan û derbiderkirina xelkê û tevlîhevkirina çavkaniyên jiyana wan, tiştek din tune ye. Çumku Komara Îslamî û xizmetkirin, du tiştên ji hev biyanî ne.

www.arsivakurdi.org

Rojev

# Komara Îslamî gefek mezin li ser tenahiya navnetewî



Selîm Zencîrî

Li demekî herî hesas û dijwar de ku Komara Îslamî a Îranê bi rijdî li hewildan û tekoşînê de ye ku tîrojkekê ji bo helatin û vereviyan ji givaşên navnetewî û pêşgêrî ji xurtbûna wan guşaran bibîne, dîsan kete boseya navnetewî û xalek din ya nerênî bi karnameya reş a xwe zêde kir. Eşkerebûna barê neyasayî ê şandî yê çek û teqemeniyên Îranî li Nîciriyê de, mijar û bûyerek din e ku carek din rejîma Komara Îslamî û siyasetên şerxwazane yên wê kire rojeva siyasî ya cîhanê û rûreşî û şermezariyek din bo rejîmê bi dû xwe re anî. Ew gemiya hilgirê vî barê neyasayî yê çek û teqemeniyan ku ji ١٣ kantîniran pêkhatibû, roja ٢٦'ê Çiriya Pêşîn a ٢٠١٠'an li Berava Lagos'ê de ji aliyê dezgehên ewlekarî yên Nîciriyê ve destbiser de hat girtin ku di bin navê alavên malçêkirinê de radeyek yekcar zaf sîlahên giran têde hatibûn cihdan.

Wezîrê Karê Derve yê Komara Îslamî her terze pêwendiyek bi wî barî re red kir. Lê berdevkê rêxistina ewlekarî ya Nîciriyê da zanîn ku alav li barnameyê de bi navê madeyên malçêkirinî hatibûn tomar kirin, herweha eşkere kir ku wan ew gemî berî gihîştina bi Nîciriyê xistibûn bin çavan û meqseda rastîn a wê jî Nîciriye bûye, lewma her terze hêcet û pasawek rayedarên Îranê li dor şandina bi şaşî a wî barî direv û virek mezin e.

Kompaniya CMI- CGM ku berpirsiyarê veguhastina wî barî bû û binkeya wê jî li Firansayê de ye. Eşkere kiriye ku ew kantînêr ji aliyê bazerganek Îranî ve li Bender Ebasê de di bin navê alav û madeyên awahî çêkirinê de hatin barkirin, lê navê wî li nav tu yek ji lîsteyên qedexekirî de nahê xuyakirin.

**Dosya pêşkêşî Civata Ewlekar hat kirin**

Pêka biryarnameya Konseya Ewlekar hemû welatê endam li NY' de mafê pişkinîn û geryana li nav barên bi meqseda Îranê de hene, lewma piştî destbiserde girtina wî barî û lêkolînên hewce li vê derheqê de, bona hevgavî û bi biryarname û dorpêçên navnetewî li dijî Îranê bi taybet ya ١٩٢٩'an, neçar man ku vê dosyayê radestî komîteya tehrîmên civata Ewlekar bikin.

**Du fermanderên hêza Quds a Sipaha pasdaran têkildarî wî karê neyasayî ne**

Pêka nûçegihaniyan du Îraniyên ser bi sipaha Pasdaran û dîplomatên ser bi Balyozxaneya Îranê li wî welatî de pêwendî bi wî barê çek û teqemeniyan re hene û niha xwe li nav balyozxaneya Îranê de veşartine, lewma Wezareta karê Derve a Nîciriyê serbarê gefan, pir hewil da ku ji riya wan du kesan ve hûrdekarî û zaniyariyên hewce li vê derheqê de bidest bixe, lê dewleta Îranê bi tu awayekê izin neda ku lêpirsîn ji wan bihê kirin.

**Sefera bêencam a Menûçêhr Mutekî**

Wezîrê Karê derve yê Komara Îslamî, Menûçêhr Mutekî, li seferek jinişkîveyî û bilez de ku renge bi canteyên tejî dolar û soz û poanên aborî be, çû Nîciriyê û hewilda ku vê meseleyê li pişt perde û bi nepenî çareser bike û pêşiya biryara dewleta wî welatî li dor şandina vê dosyayê bo Civata Ewlekar bigre, lê li tekoşîna xwe de biser neket û bêencam û dest vala vegeriya. Herçend piştî vegerê jî ragihand ku dujminên Îran û Nîciriyê xwastin bi vê çendê aloziyê bixin nav pêwendiyên me her du aliyan de û got ku bi xweşî ve niha ew mesele ji bo dewleta Nîciriyê eşkere bûye ku armanc ne Nîciriye bûye. Herweha got ku ew bar ji aliyê kompaniyek şexsî ve hatiye şandin, lê ev gotina Mutekî bi tewahî dûre ji rastiyê, çûnku seneta leşkirî, berhemanîna çek û teqemeniyan û derfirotin kirina wan sîlahan li bin çavdêrî û kuntirola Wezareta Berevaniya Îranê de ye û beşa taybetî mafê sermiyandayînê li vê beşê de nine.

**Armanca sîlahan kîder bûye?**

Rêxistinên ewlehî yên Nîciriyê didin zanîn ku ew barê sîlahan bona pêkanîna alozî û nearam kirina Nîciriyê li egera serneketina dijber û şoreşiyên dijî dewleta niha li hilbijartinên pêşber de hatiye şandin. Çunku şoreşî û dijberên Nîcirî bi salan e ku bi awayek neyasayî çek û sîlahan li dijî dewleta hakim dikrrin, lê eva cara yekemîn e ku bi wî awayî çekên giran bidest bixin. Lê hin rapor jî didin xuyakirin ku armanca sereke ya wî barî, welatê Gambiya li rojavayê Afrîqayê de bûye. Herweha medyayên Îsraîlî jî li zarê berpirsiyarên wî welatî ve didin zanîn ku rejîmê ew barê sîlahan ji bo rêxistina terorîstî a Hemasê li Xezeyê de şandine.

**Qirarê lîstika dostane ya Fotbolê li navbera her du welatan de hat hiloşandin**

Li halekê de ku Wezîrê Karê Derve yê Komara Îslamî bi xweşbînî ve bas ji çareserbûna wan "Sû tefahom"an dikir, Federasiyona Fotbolê a Nîciriyê li nameyekê de eşkere kir ku qerarê leyîza dostane li navbera tîmên her du welatan de tê hiloşandin, lê neda xuya kirin ku ew biryar pêwendî bi eşkerebûna wî barê qaçax yê sîlahan bûye yan li encama bandora tehrîm û dorpêçên navnetewî li dijî Îranê de ye ku tesîra xwe li ser fotbola Îranê jî kiriye.

**Encam**

Armanca ew barê eşkerebûyî yê çek û teqemeniyên Îranî her cihek be, vêca çi ji bo Hemasê, çi ji bo şoreşî û dijberên Nîcirî û çi jî ji bo Gambiyayê be, merem tenê pêşvebirina siyasetên şerxwazane û geşandina agirê alozî û nearamiyê li wan welatan de ye ku bûye stratejîk ji siyaseta derve ya rejîmê. Çunku her li van du mehên derbasbûyî de eva duyemîn barê sîlah û teqemeniyên qaçax yên Komara Îslamî ne ku tên eşkere kirin. Lê bi vê kiryarê serbarê wê ku alozî kete navbera dîplomasî û pêwendiyên dîplomatîk yên her du aliyan, dosiye jî radestî Kunseya Ewlekar hat kirin ku eva jî karîgerî û bandorek pir xerab û nerênî dê ji bo Komara Îslamî li pey xwe re bîne. Her ev siyasetên şerxwazane û alozî afirîn û rêxweşkirin û piştewaniya ji terorîzmê ye ku rojava bi nîsbet programên navikî yên rejîmê bikewe şik û gumanê û dijberiya pêre bike. Anku bi van kiryaran bûye faktera herî bihêz ya gef û metirsiya li ser tenahî û ewlehiya navnetewî, bi vê çendê jî em dibînin ku li hember de hêz û pêla li dijî rejîmê li asta navnetwî de bilez li halê pêşveçûn û geşandinê de ye.



Sarkozî:

## Rejîma Tehranê mezintirîn gefa mûşekî li ser Ewropayê ye

Nîkolas Sarkozî, Serokkomarê Firansayê li civîna NATO' ê li Lîsbûna Purteqalêde axaftinek pêşkêş kiriye û têde tekez kiriye ku rejîma Komara Îslamî, gefek mezin a mûşekî bo se welatên Ewropayî tê hejmar.Eve jî li halekê de ye ku berpirsiyarên NATO'ê di yekemîn rûniştina xwe de li ser terhê çêkirina Mertala berevaniya mûşekî lihev hatin. Herweha daxwaz ji Rûsiyayê jî hatiye kirin ku li vî warî de hevkariyan bike û ew yeka jî her ji niha ve bi bûyerek dîrokî tê hesibandin.Herçend di di daxuyaniya Rêxistina Nato'yê de navê hikûmetên gefker nehatiye eşkere kirin, lê diyar û eşkere ye ku gefên mûşekî ên niha ji aliyê rejîma Tehranê ve ye. Eva ku birêveberên ٢٨ welatên Nato'yê di rûniştinên xwe de dixwazin bipejirînin, tê manaya qonaxek nû ji jîna Peymana Atlantîka Bakûr de ye.

# Bi Rastî Jin Çi Dixwazin?

**W: Hemîd Muxtarî**

Rojekê paşayekî ciwan bi navê Artor ji aliyê paşayê welatê cîranê xwe destbiser û tê zîndanîkirin. Paşa dikarî Artor bikuje, lê kete jêr bandora ciwaniya Artor û nêrîn û baweriyên wî. Lewra paşa ji bo azadiya wî mercek danî ku diviya bersiva pirsek pir giran bide. Artor bi qasê salekê derfet hebû da bersiva pirsê peyda bike û ger piştî salekê nekarîba bersivê peyda bike, dê hatiba kuştin. Pirs eva bû: **Bi rastî jin çi dixwazin?**



Ev pirse heta piraniya zana û mirovên têgihîştî jî ecêbmayî dikir û dixist nava hizr û ramaman û wisa xuya bû bersiva vê pirsê ji bo Artorê ciwan nedihat peydakirin. Lê ji ber ku qeûlkirina vê mercê ji qebûlkirina mirinê baştir bû, Artor pêşniyara Paşayê ji bo peydakirina bersiva pirsê di heyamê salekê de qebûl kir.

Artor vegeriya welatê xwe û dest bi nêrînxwastinê kir ji gişt xelkê. Ji Şazadeyan bigire heta qeşeyan, ji mêrên têgihîştî heta henekçiyên koşka paşayetiyê.... digel hemûyan qise kir, lê tu kesê nekarî bersivek bihêz û cihê qebûlê bo vê pirsê peyda bike. Jimareyek zêde ji xelkê daxwaz jê kirin ku ligel sehrbaza pîr ku dihat texmînkirin tenê kesek be ku bersiva vê pirsê dizane, ravêjê bike. Helbet heqdestê wê gellek zêde bû û navbirî ji wergirtina heqdestê zêde bi nav û debg bû.

Dema roja dawî hat, Artor hizr kir ji xeynî ravêjkirin digel sehrbaza pîr tu rêçareyek din nîne. Sihrbazê rezamendiya xwe derbarê dana bersiva pirsê diyar kir, lê beriya wê daxwaz ji Artor kir ku heqdestê wê qebûl bike.

Sehrbaza pîr dizwast ligel Lord Linslot, dostê herî nêzîk yê Artor û paktirîn şervanê wî welatî bizewice! Artor bi bihîstina vê daxwazê tirs kete dilê. Sehrbaza pîr pir kirêt, xwîn tal û tirsnak bû û tenê didanek hebû, bêhna genî jê dihat, dengê wê tirsnak û nahez bû û gelek tiştên din ên tirsnak ji wê dihat dîtin. Artor di hemû jiyana xwe de ligel canliberek bi vê naheziyê rûbirû nebibû, lewra qebûl nekir ku hevalê xwe bo qebûlkirina zewacê digel Sehrbaza pîr bixe bin givaşan û wî neçar bike karek han qebûl bike. Lê dostê wî, Linslot agehdarê vê pîşniyarê bû û ligel Artor qise kir. Wî got tu cangoriyek li hember canê Artor nahê berhevdankirin û cane Artor pir ji van cangoriyan pir bihatir e. Lewra rê û resma zewca wan hat ragihandin û Sêhrbaz bersiva pirsê da. Pirsa Artor ev bû: **Jin bi rastî çi dixwazin?**

Bersiva Sêhrbazê eva bû: **"Ew dixwazin bi xwe berpirsê jiyana xwe bin".**

Gişt xelkê wî welatî zanîn ku bersiva Sêhrbazê heqîqetek rastîn eşkere kiriye û Artor dê ji mirinê rizgar be û her wusa jî lê hat. Paşayê cîran azadiya Artor jêre kire diyarî û Linslot û Sehrbaza pîr cejna mezin a zewacê lidar xistin.

Meha hingivînî nêzîk dibû û Linslot xwe ji bo ezmûnek pir ji tirs û xof amade dikir.

Li roja xwe ya diyarîkirî de bi nîgeraniyek zor çû nav oda bûk û zava de. Lê çi rûmetek li benda wî sekinî bû? Jina herî ciwan ku heta niha di jiyana xwe de nedîtibû li ser textê li benda wî sekinî bû. Linslot ecêbmayî ma û pirs kir çi bûye?

Jina ciwan bersiva da: Ji ber ku we digel sehrbaza pîr bi ciwanî riftar kiriye, niha pêde ew dikare ji ٢٤ demjimêran ١٢ demjimêran ciwan be û ١٢ demjimêrên din jî hemen jina tirsnak û naşirîn be. Piştre sêhrbazê jê pirsî: "Tu kîjan demê hildibijêrî? Ciwanî li roj û kirêtî li şev yan berevajî...?"

Linslot li ser pirsa han hinek fikirî. Ger ciwaniya wê li nav rojê de daxwaz kiriba, ew dem dikarî hevjîna xwe ya ciwan nîşanê dost û hevalên xwe bide, lê şevê hemen sêhbaza pîr li koşka xwe de hebe! Yan rojve taba vê sehrbaza nahez û kirêt bike, lê şevê xwediyê jinek ciwan û spehî be ku demên gellek xweş û bê mînak ligel de derbaz bike.

Ger hûn mêrek bin û vê mijarê bixwînin... hûnê kîjanê hilijêrin?


Ger hûn jinek bin ku vê çîrokê dixwînin, çavnihêr dikin hevjînê we çi hilbijêre? Hilbijartina xwe beriya xwendina doma çîrokê, binivîsin.

**Hilbijartina Linslot eva bû:**

Linslotê pak û rêzdar agehdar bû berê sehrbaza pîr çi bersivek dabû Artor, lewra bersiv da "Ezê mafê hilbijartinê bidim wê bi xwe da hûn biryarê bidin". Bi bihîstina vê bersivê, Sêhrbazê ragihand dê bo herdem û li her cihekê ciwan bimîne, ji ber ku Linslot rêz ji bo jinan danîbû da bi xwe berpirsê jiyana xwe bin.

Niha bi raya we xala exlaqî ya vê çîrokê çi bûye?... nêrînên xwe ji me re bişînin.

## Bawerî bi Wilayeta Feqîh yek ji mercên zewicînê!



Li rex kiryar û hewildanên bêsînor ku ji bo helandina civakê li dezgeha hizrî a sîstema Wilayeta Feqîh de tê encam dayîn, Komara Îslamî desttêwerdan û mejî şoştina civakê li perwerde, zanko, şeqam û cihê ka de bi têr nizane û ew kişandiye nav çarçoveya têkilî û pêwendiyên herî taybet yên şaromendan de.Li go nûçeyan, Mêrdad Bezirpaş, serokê rêxistina netewî a ciwanan, li ٤'ê Çiriya Pêşîn de ragihandiye ku bawerî bi Wilayeta Feqîh û pêrewî ji wî yek ji mercên giştî ji bo keç û kurran e.

Rejîm bi wan guhertinên ku berevajî xwasta wê li asta çandî ya civakê de şekil girtiye û xurt dibe, neça bi piropagendeya çandek din û helandina li Wilayeta Feqîh de bûye. Ji hêlek din ve jî Komara Îslamî b haydana çanda mêrserdestane û mercdanîna sunetî ji bo mêran, qadê ji bo pêşveçûn û geşandina wan ( herweha jinan tengtir dike. Ew rêxistin bi ragihandina mercê pêrewî ji Wilayeta Feqîh bo zewicînê sedemek din ya bikerb û kîn û metirsîdar jî bi sedemên telaqê zêde kir ku bi awayekê tepeseriya nerasterast û herweha haydana hevser û malbatên wan e bi sîxorî û heta tolhildanên nemirovî.

# Telaq li Îranê, kirîz yan çareserî?



Encama vekolînekê li Tehranê derxistiye ku temenê diyardeya telaqê li Îranê daketiye û amara telaqê li bajarê Tehranê ٣ beramberî deverên din ên Îranê ye. Ew diyardeya ku niha berçêla civaka Îranê girtiye, yek ji metirsiyên pir ji kirîz e ku civakê ber bi neman û jihevveqetiyanê dibe.

**A: Şerîf Felah**

Di heyamên salên derbasbûyî de yek ji wan diyardeyên civakî û pirr ji arîşe ku di nav civaka Îranê de bûye cihê metirsiyê û roj bi roj zêde dibe, diyardeya ji hevveqetiyana jin û mêran "telaq" bûye. Sedemên serhildana wê diyardeyê pirr in, ku rewşa civakê û siyaseta şaş a civakî û çandiya zal bi ser Îranê de yek ji wan e. Her çend vekolerên warê civakî û çalakên warê mafên jiyanê û diyardeyên civakî di wî warî de gelek hewl û xebat ji bo çareseriya wê diyardeyê kirine, lê siyaseta cudahiya regezî, sansor û ew nêrîna teybet a rejîmê weke rêgir û astengekê di beriya wan hewlan nahêlin bigîje encamên pêwîst. Her çend rejîmê di rûyekî de gelek nawend û saziyên parêzerên malbatan damezirandine û gelek made û xal di yasayên wan de cihdane, lê bi kiryar û di piraktîk de ne tenê tu gavek neavêtiye, belkî tawanbarê sereke yê geşekirina diyardeya telaqê ye.

Bo mînak, çend roj berî niha di Zankoya zanistên civakî de li Tehhranê, rûniştinek berîn li jêr navê "telaq li Îranê, kirîz yan rêçare" hat lidarxistin ku têde xincî pêşkêşkirina çendîn vekolîn di wî warî de, hin amar û data xistin rû. Dr. Husên Husênî, endamê heyeta zanistên civakî ên Zanîngeha Tehranê di wî warî de got: Di peywendî digel amara telaqê di Îranê de, piştî Tehranê, Xurasana Rezewî, Îsfehan û Fars pileya duyem heya çaremîn hene. Xincî wan amarane, sedemên zêdebûna telaqê, bas jê hatiye kirin ku nasîna berî jiyana hevpar bi yek ji rêkar destnîşan hatiye kiri. Navhatî li vê derheqê de gotiye: keç û xort dibe heyameke zaf bihevre bin û hev binasin, bi başî ji hev têbigîjin, lezkirin di wî warî de akamek xirab û jihevveqetyan jê dikeve. Dr. Husên diyardeyên weke: bêkarî, îtiyad û peywendiyên sar û sirr ên hevjiyan bi sedemên din ên telaqê wesif kiriye. Herweha navhatî amaje bi wê yekê kir ku telaq di hin waran de jî rêçare ye û got: vekolînan derxistiye ku di berhevdanek di navbera wan malbatên ku ji hev veqetiyane li gel wan malbatên ku berdewam pirsgirêk û arîşe hene, zarokên malbatên ji hevveqetiyayî di rewşek baştir de ne û kêmtir tûşî giriftan bûne.

**Zêdebûna telaqê di nav qata ciwan:**

Di wê rûniştinê de, ٢ mamosta û pisporên Zanîngehan dest dane lêkolîn û şiroveya vê diyardeyê û gihîştine vê encamê ku pirraniya caran siyaseta Komara Îslamî ku ciwanan bo pêkanîna jiyana hevpar han dide, şaş e û pirraniya telaqan seba lezkirin û jihevtênegihîştinê de ye û pirraniya wan jî di nav qata ciwan de ye. Amarek ku di vî



warî de hatiye nîşandan, derxistiye ku sala ١٣٨٨ a rojî, pêtirîn rêjeya telaqê di nav jinan de bûye ku di temenê ٢٠ heya ٢٤ saliyê de bûne û ji bo mêran di navbera ٢٥ heya ٢٩ saliyê de bûye û eva jî wê yekê derdixe ku diyardeya telaqê di nav ciwanan de rû li zêdebûnê ye.

Yek ji sedemên ku dibe seba jihevveqetiyana jin û mêran, geşenekirina çanda pêkanîna jiyanê ye ku mixabin eva di Îranê de bi rohnî û eşkereyî tê dîtin û li batî wê ku ev sedemane hevdem ligel pêvajoya serdem de jar û lawaz bibin û bihên dûrxistin, pêtir serî hildiden û bûne bi mezintirîn pirsgirêk û kosp li ser riya malbatan.

## Îdz li Îranê wek borkanek temirî ye ku dê bi zûyî serî hilde

**Pêtir ji ٪٩٠ a tûşbûyên Îdzê li Îranê di riya peywendiyên cinsî, bi taybet di bajarên mezin de û di navbera temenê ٢٠ heya ٣٠ saliyê de ne.**




Serokê nawenda lêkolînî a Îdzê ser bi Wezareta saxlemiyê li vê derheqê de da zanîn: Ger gihandina zanyariyan li ser vê nesaxiyê li nav xelkê de xurt nebe, bi zûyî emê şahidê teqîna wê nexweşiyê di nav civakê de dibin, çunku weke borkanek vemirî ye ku dibe bizûyî em li benda ektîvbûna wê bibin.

Dr. Mîno Muheriz got: Renge em nekarin bi ronî bêjin ku ٪١٠٠ a tûşbûyên bi nesaxiya Îdzê, ji riya peywendiyên cinsî ve bûye, çunku renge hejmarek kêm jî hebin ku ji riya îtiyada "tezrîqî" ve tûş bibin.

Serokê nawenda lêkolînên îdzê li Zanîngeha zanista pijişkî a Tehranê jî got: Bi guherîna riyên tûşbûna bi îdzê ji riyên cinsî ve, hêdî hêdî hejmara jinên tûşbûyî bi vîrosa îdzê di welat de zêde dibe. Diyare hêj hejmara wan negihîştiye ٥٠-٥٠ li nav jin û mêrên de, lê niha nizîkî ٪٣٠ a nû tûşbûyên bi îdzê, ji jinan pêk tê.

## ٢٠ ji sedî ya xwazyarên telaqê, bêkar yan jî kedkar in

Elî Nahîdtîtkanlo got: ٢٠ ji sedî ya xwazyarên telaqê, di ragihandin bi nawenda mişêvire ya malbatê, bêkar in û ٣٠ ji sedî ya wan jî xwediyê pîşeyeke bêkêr yan jî kedkar in.



navbirî mesela abûrî û nedarî bi yek ji sedemên telaqê zanî û got: ٢٣ ji sedî ya mêrên ku daxwazê ji nawenda şêvrmendiyê dikin dahatek kêmtir ji ١٠٠ hezar tûmen hene û ٣٠ ji sedî ya wan jî dahatek kêmtir ji ٢٠٠ hezar tûmen di mehê de hene.

Navhatî got: nebûna pîşe û bêkarî derxerê asta abûrî, civakî û xwandina nizim a daxwazkerê telaqê bûne û herweha nebûna zanyarî di meselên malbatê û peywendiyên cinsî pêvajoya zêdebûna pirsgirêkên malbatan di navbera jin û mêran de pêtir dike. Herweha Tîtkanlo got: pirraniya kesên ku pîşeyên nizim hene gîrodeyî îtiyadê ne ku seba pêwîstiya madeyên hişber, pirraniya dahata xwe bo bidestxistina madeyên hişber terxan dikin ku pêragihîştinek dermanî û bilindkirina asta abûriya jiyana xelkê ku ٩٠ ji sedî ya xelkê Îranê ligel wê arîşeyê ber bi rû ne, dikare zemîneya kêmbûna telaqê û pirsgirêkên malbatan xweş bike.

www.arsivakurd.org

# Bîranîna Amûda Şewitî

**Kewêzer**

Rojên reş di dîroka gelê me de pirr in, lê hin bûyerên tehl di dîroka vî gelî de hene ku piştî sedan salan jî li dema bîranînê de wijdana mirovan dihejînin.

Di dirêjiya dîrokê de li her cihekê vê cîhanê şer û aloziyek di navbera welatan de heba, zordarên desthilatdar bi ser gelê me de, bi derfet dizanîn û bacek jî ji gelê me distandin.

Vêca çi şerê desthilatên mezin ên Osmanî û Sefewiyan û di encam de duperçebûna Kurdistanê, çi şerê duyem yê cîhanî û parvekirina Împeratoriya Osmanî û sêperçebûna beşa mezin a Kurdistanê bigre, heya şerên du dewletan weke şerê Firansa û Elcezayirê û di wê riyê ve pîlandanan ji bo şewitandina Sînemaya Amûdê û di encam de kuştina ٢٨٣ zarokan yan jî şerê ٨ sale yê Îran û Îraqê û hatina Sipaha Pasdaran a Îranê bo nav jin û zarokên xelkê bajarê Helebçê û kîmyabarankirina wî bajarî ji aliyê rejîma Beis a wê demê a Îraqê ve û kuştina ٥٠٠٠ jin û zarokên bêtawan. Bi wan egeran ve danîna navên xemgîn û tirajîdî li ser bajarên Kurdistanê weke Amûda Şewitî, Helebceya Şehîd, Sineya Xwînawî, Diyarbekira Şewitî û ... çima?

٥٠ salan berî niha, Elcezayirê li hember Firancayê serhildan kir û şoreşek mezin birêxist ji bo xweseriya welatê xwe. Çavtariyên Ereb ên desthilatdar bi ser Kurdên perçeya Sûriyê jî ew alozî bi derfet zanîn û di kiryarek şovenîstane ya Erebî de bi armanca hevkarîkirin bi şoreşa Erebên Elcezayirê, dest bi bacwergirtin ji xelkê hejar û nedar yê Kurd li wî welatî kirin û di encama wê çetegeriyê de, li bajarê Amûdê bajarê ku Seydayê Cigerxwîn ew bi "Bûka Welat" nav kiribû, di roja ١٣,١١,١٩٦٠' a Zayînî de, Mudîrê Nahyeya Amûdê hemû debistaniyên seretayî ên wê deverê kom kirin û birin sînemayê, bona wê ku jiber ku pereyê wan sînemayan bo şoreşa Elcezayirê bihê şandin.

Du rojan ew kar berdewam bû, lê roja sêyem ٤٠٠ zarok birin sînemayê û hemû kirin holek sînemayê de, zarokên wê deverê jî ku di jiyana xwe de yekemîn car bû sînema didîtin, bi her awayekê ba nedikarîn dil û derûna xwe qanih bikin ku tiştek nû nebînin û wek bîranînek bixin rûpelên bîranînên temenê xwe de.



Lê xelkê wê deverê, bêxeber ji wê yekê ku zarokên xwe ên sade û sawîlke xistine nav destên gurên birsî û tênî ji xwîna Kurdan. Wan, zarokên pêşeroja gelê me birin sînemayê û bi gotina nih ji kesên şahidê bûyerê, ji nişkîve motorxaneya sînemayê agir digre û bi lezek zaf ew agir tewayî sînemayê dadigre û hola ku zarok têde bûn, dike tendûrek dûdayî û ji wan ٤٠٠ zarokan, ٢٨٣ yan canê xwe ji dest dan û ewên din jî birîndar bûn.

Herçend dewleta Sûriyê heya niha jî îzin nedaye ku kes vekolînan li ser wê bûyerê bike, lê hin kes şahidê bûyerê bûne û bi gotina wan, gumanek zaf heya ku pîlanek nemirovane di wê tirajîdyaya mezin de hebûye. Tê gotin ku berpirsên sînemayê Kurd bûne û di roja ku ew bûyer çêbû, berî ku zarok biçin hundirê sînemayê, çend memûrên dewletî hatine û kilîtên motorxaneyê ji wan berpirsan sitandine û çûne hundirê matorxaneyê û pişt re kilîl dane wan berpirsên sînemayê, ji aliyek din ve jî berî ku ew bûyer biqewime, mudîrê nahiyê zarokên xwe bilez ji hola sînemayê derxistine û şandine mala xwe. Di encam de, ewên ku hatin şewitîn û canê xwe ji dest dan, tenê zarokên Kurdan bûn.

Di vir de guman eve, çima memûrek yan berpirsek Nahiyê di wê bûyerê de çi biser nehat? Gelo çima ji bo şoreşa Erebên Elcezayirê zarokên Ereban di bajarên din ên Sûryê de nedibirin sênemayan û bacê ji wan werbigirin?


Çima zarokên tu yek ji berpirsan têde nebûn? Belê ew yek jî weke her pîlanek din a dijî Kurd, pîlanek qirêj û nemirovane bûye û çavtariyên desthilatdar ên Sûriyê ji pêvajoya xwendina zarokên Kurdan tirsiyane û armanca wan binbirkirina wê nifşa xwandevan û pêşerojgeş bûye.

Ger heya niha jî ew roj ji aliyê sazî û pêkhateyên Kurdî ve bi başî nehatiye bibîranîn, pêwîste niha şûnde vekolîn li ser wê bûyerê bihên kirin û wê cinayeta mezin a dijî mirovî bi hemû cîhanê bidin nasandin û di asta cîhanî de weke xaleke reş li ser karnameya mirovkuj û xwînxwarên desthilatdar ên Sûriyê bibe hêmaya şermezarî û rûreşiya wan nemirovan.

Yadê wê roja nexweş bilind û birûmet be, hesta narîn û nazika wan zarokan bibe îman ji me re bo gihîştin bi armancên netewî û çavên wan ên geş weke ssssstêrka esmanê Kurdan, çirayê ronîker yê riya xebatkarên me be.



# Kurd Ahmet Kaya ji bîr nakin




Hunermendê kurd yê navdar Ahmet Kaya, berî ١٠ salan, li ١٦'ê Mijdara sala ٢٠٠٠'î li sirgûnê, li paytexta Fransa Parîsê, malavayî li jiyanê kir.

Berdêla îsrara wî ya di rastiyan de, bû sirgun, koçberî û di dawiyê de mirinek ji welat û heskiriyên xwe dûr... Niha xwediyê zihniyeta ku Ahmet Kaya neçarî jiyanek kambax kirin, bi awayekî dirû hewil didin lê xwedî derkevin.
Piştî salên ٨٠'î li dijî sîstema desthiladar, herî zêde dengê wî cuda derket.
Tevî ku di stranên wî de têkçûn, êş û xemgînî hebûn, dîsa jî bêhna serhildanê ji wan dihat..
١٢'ê Şibata sala ١٩٩٩'an di merasîma xelatên Komeleya Rojnamegerên Magazînê de ji ber ku got: "Ez Kurdim û ez ê stranên bi Kurdî çêkim, hunermendê navdar ji nişkîve wek xayînê welêt hate îlankirin.

Piştî hewildanên lînç û girtinê, ew neçarî koçberiyê bû û ١٦'ê Mijdara sala ٢٠٠٠'î di encama kirîza dil de jiyana xwe ji dest da.
Malbata Ahmet Kaya, piştî ku sala ١٩٥٧'an ji Semsûrê koçî Meletyeyê kir, ew wekî zarokê ٥. yê malbat li wir tê dinê...
Di ٦ saliya xwe de bi saza ku diyariya bavê wî bû, wî dest bi muzîkê kir...
Kaya piştî ku ji ber pirsgirêkên aborî koçî Stanbolê kir, êdî ne tenê muzîk, lê siyaset jî bu parçeyek ji jiyana wî.
Di ١٦ saliya xwe de bi bahaneya daleqandina afîşan hate girtin.
Tevî pirsgirêkên xwe yên aborî, wî bi kaseta xwe ya bi navê 'negirî korpeya min' gava yekemîn ya muzîka profosyonel avêt...
Abluma Kaya ya bi navê "stranên min ji çiyê re ne" ٢ mîlyon û ٨٠٠ heb hatin firotin û rekoreke mezin şikand.
Tişta ku wî pir dixwast kir, cara pêşî bi Kurdî stranek got û klîba wê jî çêkir û bi strana 'Hetta em bimrin, em kurdin' peyam da ku ewê bi paş de gavan neavêje..

١٦'ê Mijdara sala ٢٠٠٠'î dema xebatên abluma wî ya bi navê 'bi xatirê te çavê min' dewam dikirin, li taxa Portt de Versay a Parîsê ji ber kirîza dil malavayî li jiyanê kir.
Niha Kaya, li goristana Perla Şez a Parîsê bi berdewamî li sirgunê ye.
Hunermend Ahmet Kaya îsal li ١٠’mîn salvegera koça xwe de li gelek cihan de bi rê û resmên hêja hate bibîranîn û carek din wefadarî û emegdariya gel pêre hat nîşandan.
**Candname.hk**

## Fîlmê 'Bexçên bihiştê' xelata Bêrnê a ٢٠١٠an stand




١٧ heftiyan filma derhinêrê Kurd Mano Xelîl *„Baxçên Bihiştê"* „Unser Garten Eden“ li ser perda sînemayên Swîsrî bi coşek mezin hat weşandin. Bi dehan hevpeyvîn û reportaj li ser fîlm di mediyayên Swîsrî de hetine nivîsandin.

Niha Fîlm layiqî xelata sînema Swîsra a Kantona Bêrn a paytext tê.

Xelat roja çarşemî, ١٧. ١١,٢٠١٠’an li bajarê Bêrnê li „Dampfzentrale“hatdayîn.

Weke ku tê zanîn her sal li Paytexta Swîsra Bern du filmên dirêj tên xelatkirin filmek leystikvanî, yek jî dokumentar tên helbijartin û laiyqî xelatê sînema dibin.

Vê salê Mano Xelî bi filmê xwe „Baxçên Bihiştê“ xelat stand. Qîmeta xelatê, ٢٠,٠٠٠.-Frankên swîsrî ne (٢١,٠٠٠.-Dolare).
Weke ku tê zanîn ev Film ji aliyê ٤ kanalên televizyonên navnetewî; televizyona Swîsrî ya zimanê almanî SF, kanala Frensî TSR, kanala Îtali RSI û kanala televizyona Almanî ٣sat di destpêka sala ٢٠١٠ hatiye amadekirin.

"Ev film dikeve nav beşê filmên Dokudrama. Çîrokên ٥ malbatên biyanî ne ku li Swîsrê bi cih bûne. Malbatek Algîrî û Swîsrî, malbatek Polonî, ìtalî, Kroatî û kurd in".

Kaniya Helbestan

### EM WELAT DIXWAZİN



**Mehmet Çobanoglu**

Tu rûmeta gelê me yî welatê me axa me
Evîna min şiwîna te, tu qesra dilê me yî
Tu çiqilê gulanî, ronahiya roja yî
Tu roja me gela yî, welatê me Kurdayî
Ez qurban, ez gorî te, xwesta me welat e
Hûn werin canên me îro me re şer û şenge
Xwe ragirin gelên me berxwedan jî jiyane
Pir xweşe pir şêrîne paytexta me Amed e
Tu bo me rûmetî welat ê me tu hebûn î
Tu helnaşî tu zexmî dîroka te pir kevne
Hezar salên tu heyî diyarê Mem û Zîn î
Mala Ahmedê Xanî welatê me Kurda yî
Tu welatê gelanî tu wergehê gulanî
Tu axa hebûniyê tu roja ronahiyê
Semsûr,Dilok û Êlih,Dêrsim bajarên te nin
Warê me welatê me gerîllanin şêrên te
Axa me warê me zarokên me şervanên me
Jin û mêrên gelên me leheng û şêrê te nin
Em dişkînin zincîrên zordaran û bêbextan
Em dixwazim Kurdistanê ez Memê Qaqizmanê.

www.arsivakurdi.org

agiri

Duheftînameyek siyasî, civakî, çandî û hunerî ye ku Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat:
AFK B.P. ١٠٢- ٧٥٦٢٣ Paris CEDEX ١٣ –FRANCE

E - Mail: agiri٢٠٠٣@hotmail.com
agiri٢٠٠٣@gmail.com, rojnamaagiri@gmail.com



## Kirawata Îslamî jî peyda bû!!




Bi îlhamwergirtin ji şûra Îmam Elî, Kirawata Îslamî ku bi hedîsa "Zulfeqar" hatiye xemlandin, hat terh û tomar kirin.

Terhê Kirawatê ji aliyê Himet Komîlî ve li ser bingeha wê ku gelek ji mamostayên ayînî û mercei li civakên bisilman, bi taybetî li Îranê de, mifahstandina ji Kirawatê bi kesên nebisilman dişibînin, hatiye darêtin. Lewma ew terh serbarê hebûna ciwaniya rûyekî a Kirawatê, eyankerê erzişên îslamî ye jî. Bi raya gelek ji karnas û çavdêran ew terhe dikare zêdetir tund û tûjiyê xurt û cudahiya li navera olan de jî firehtir bike.

**Aftab**

## ١٧٢ hezar kevir di nav gurçikên mêrekî Hindî de hatin derxistin





Pêka nûçeya malpera "Yanz", pijîşkek Hindî bi navê Aşîş Rawindal Patîl, piştî ku karî ١٧٢ hezar û ١٥٥ keviran di gurçikên nesaxekê de derbîne, rekordek nû bi navê xwe di pirtûka "Gêns" de tomar kir.

Nesaxê han ٤٥ salî ye ku êş û azarek zaf li bedena wî de hebûye û pêştir jî seredana çendîn pizîşkan kiribû, lê tu yek ji wan nekarîbûn nesaxiya wî diyar bikin.

Piştî wê ku ji aliyê Rawindal ve nesaxiya wî hat dîtin, neştergerî jêre hat kirin û paşan hemû rojê demê ٣ demjimêran ew kevir dihejmartin û piştre hejmara giştî ya wan keviran hat diyarkirin ku ١٧٢١٥٥ heb kevir bûn.

## Kurdekî Rojhilatê Kurdistanê bû birêveberê Youtube'ê




Chad Harley, cîgirê xwe yê Kurd Salar Kemanger kire mudurê Youtube'ê.

Salar Kemanger bi xwe ji Kurdên Rojhilatê Kurdistanê ye û li Amerîka dijî.

Kemanger berê di şîrketa Google'ê de birêvebirî kiribû.

Salar Kemanger sala ١٩٧٧ li Tehranê ji dayîk bûye û li Amerîka beşê biyolojî qedandiye.

Ev ٧ sal bûn ku di Google'ê de dixebitî û niha jî di ٣٤ saliya xwe de bûye mudurê Youtube.

**avestakurd**


## ١٣٠ Kg Hiroyîn a Rejîma Îranê li Nîciriyê de hat girtin



Berpirsiyarên gomrika Nîciriyê li Lagos'ê de dan zanîn ku hêzên wî welatî, barek mezin a Hiroyînê (bi qasê ١٣٠ KG) bi tîratiyek bilind ku ji aliyê Komara Îslamî ve hatibû şandin, destbiserde girtine.

Ew bar bi gemiyek bi navê Montengiro. M.W ji Îranê hatiye barkirin ku li nav kantînêran de hatibû veşartin.

## Dermanê zivistanê; Pirteqal



Ji ber ku Pirteqal madayek pir vîtamîn C dihewîne. Mehên zivistanê hêz û berxwedana beden li hember nexweşiyên ji sermayê tên û kelijînê diparêze. Taybetiya wê ya teb daxistinê heye.

Hewceye berî mirov nexweş bibe pirteqalan bixwe. Piştî nexweşketinê, pirteqal beşek ji taybetiya xwe ya xweşkirinê winda dike.

Di pirteqalê de ji ber ku pir vîtamin û fosfor heye, bêhalî û kêmhêziya rehan û hêrsbûnê radike.

Pirteqal mîkrobên di nava dev de jî dikûje. Bê pirûzbûn û tazetiya çerm jî pêk tîne. Bêxwîniya nexweş û zarowan diborîne. Madeyên xisardar yên di nava xwînê de paqij dike. Fêqiyek ji yên herî başe ku pêşiya penceşêrê digire. Heke pirteqal piştî xwarinê bê xwarin, avzêkên aşikê zêde dike. Givirandinê (hezmê) hêsan dike, ji bo daxistina şekirê nava xwînê dibe alîkar. Pirteqal ji bo nexweşên şekir hem wezîfa qût (xwarin û xida) hem jî ya dermanbûnê dike.

*(HAWAR NET)*

www.agirikurdi.org